

zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

# KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT



# BOOKS PUBLISHED IN 1981-1986

*Gunilla Bergstrom*

**Alfons û cinawir**

ALFONS OCH ODJURET

Alfie and the monster

ISBN 91 86146 009

*Astrid Lindgren & Ilon Wikland*

**Keça şerrût Lotta**

LOTTA PÅ BRÄKMAKGARTAN

Lotta at the Bräkmakargatan

ISBN 91 86146 017

*Astrid Lindgren & Ingrid Nyman*

**Pippi ya goredirêj**

KANNER DU PIPPI LÄNGSTRUMP?

Do you know Pippi längstrump?

ISBN 91 86146 068

*Astrid Lindgren & Ilon Wikland*

**Belê Lotta kare bajo**

VISST KAN LOTTA CYCKLA

Of course, Lotta can ride a bike

ISBN 91 86146 033

*Gunilla Bergström*

**Ma tu tirsonek û Alfons Aberg?**

AR DU FEG ALFONS ÅBERG?

Are you coward Alfie?

ISBN 91 86146 05 X

*Astrid Lindgren & Ilon Wikland*

**Binêre madîkan, berf dibare**

TITTA, MADICKEN, DET SNÖAR

Look, Madicken, it is snowing

ISBN 91 86146 11 4

*Lennart Frick & Jean Carlbrand*

**Ma gakûvi kûçikan dixwin?**

ATER ALGAR HUNDAR?

Do elgs eat dogs?

ISBN 91 86146 09 2

*Bengt Arne Runnerstrom*

**Arhuaco - Sierra Nevada**

ARHUACO - SIERRA NEVADA

Arhuaco - Sierra Nevada

ISBN 91 86146 16 5

*Gunilla Bergstrom*

**Şev baş Alfons Aberg**

GOD NATT ALFONS ÅBERG

Good night Alfie

ISBN 91 86146 17 3


*Petra Szabo*

**Emil, miha nîvçe**

EMIL, DET HALVA FÄRET

Emil, the half sheep

ISBN 91 86146 19 X



Kurdiska Kulturförlaget  
BOX 161 39  
103 23 STOCKHOLM / SWEDEN  
Postgiro 79 05 24 - J  
Bankgiro 137 8538 (Forsa Sparbanken)

*Inger & Lasse Sandberg*

**Kino digot, li wê derê binêre**

TITTA DAR, SA PULVRET

Look there, said Dusty

ISBN 91 86146 08 4

*Inger & Lasse Sandberg*

**Kino digot, alîkâri bikim**

HJALPA TILL, SA PULVRET

Help, said Dusty

ISBN 91 86146 07 6

*Gunilla Bergstrom*

**Alfonsê şit**

LISTIGT, ALFONS ÅBERG

Crafty, Alfie

ISBN 91 86146 10 6

*Astrid Lindgren & Björn Berg*

**Gava Rindikê şumiyan bike**

NAR LILLA IDA SKULLE GÖRA HYSS

When little Ida got up to mischief

ISBN 91 86146 14 9

*Gunilla Bergstrom*

**Kî Alfons rizgar dike?**

VEM RADDAR ALFONS ÅBERG?

Who saves Alfie?

ISBN 91 86146 13 0

*Zacharias Töpelius & Veronika Leo*

**Sampo lapecan**

SAMPO LAPPELILL

Sampo Lappeill

ISBN 91 86146 12 2

*Margareta Ekström & Petter Petterson*

**Pisîngê ku wenda bû**

KATTEN SOM FÖRSVANN

The cat that disappeared

ISBN 91 86146 15 7

*Lennart Hellsing & Sven Otto S*

**Kundirê helez**

DEN UNDERBARA PUMPAN

The wonderful pumpkin

ISBN 91 86146 18 1

*Inger & Lasse Sandberg*

**Bavo, were derive**

PAPPA, KOM UT!

Daddy, come out!

ISBN 91 86146 20 3

*Astrid Lindgren & Björn Berg*

**Şûmiya Zirek ya hejmar 325**

EMILS HYSS NR 325

Emil's prank number 325

ISBN 91 86146 21 1

Weşanxana Çanda Kurdi

"Z A R O K   F É K I Y É   M A L A N E"



**HÊJE MÊJE, EMÊ NUHA ÇEND**

**ÇIROK Û MESELÊN XWE**

**JI WERE BÊJIN**

**KULÎLK**

Çîrok : KAR, GÎSK ^ Ü NERI ^ (2)  
Werger: Bavê Hêvi

Pir başe!.. De zû here,bila çavên min te  
nebînin.Ezê li benda gîskê bimînim.  
Bi wî awayî,karik di ser pirê re derbasbû  
û bi lez û bez û bi şadî berê xwe da wê  
mêrga xwes û şîn.



Dor hat ser gîskê û wê xwast di ser pi-  
rê re derbas bibe.Tep û repa lingên wê dêw  
şiyar kir.



Humînî bi dêw ket û ji bin pirê der -  
ket.Gîska reben hingî tirsîya,kirî di pi-  
rê werbûba.Dêw bi dengekî bilind û hey -  
bet got:

-Ew kî ye,li ser pira min dike tep û  
rep ?



Tirsek mezin ket dilê gîska belengaz û  
bi dengekî melûlî lê vegerand:

-Ew ez im.Ew gîska jar im.Ez deherim  
wê mîrga han,da ku biçêrim û qelew bibim.

Bû qîrîna dêw û got:

-Ezê nuha bêm û te bixwim.



Gîskê got:

-Oh ! na,ez ketim bextê te,tê min nex-we.Ez ne pir mezinim û ne jî pir qelew im Ma çima tu li hevîya nêrî yê mezin namîne? Ew him ji min mezintir û him jî qelew tir e.



Dêw got:

-Gelek başe.De zû ji ber çavin min wenda bibe.Ezê li benda nêrî bimînim.

Bi wî awayî gîskê jî xwe ji nav lepêñ dêw xelaskir û bi keyf berê xwe da wê mîrga şîn.

Dor hat ser nêrî.....

(Dûmahîk heye)



DI NAV HER DU RESMAN DE PENÇ TIŞT NEWEK-  
HEVIN. MA HUN DIKARIN WAN BIBİNİN ?



QUNCİKA DİROKA EDEBEYETA KURDİ  
XARIS BITLISİ (2)

Li gorî tê gotin: Mecnûn kurê dayk û bave kî belengaz e.Leylê qîza malbatek dewlemend e.Mecnûn ji Leylê hez dike û dixwaze,ku Leylê ji wî re bixwazin.

Dayka Mecnûn diçe xwezgînîyê,lê dayk û bavê Leylê wê nadin.Dayka Mecnûn polî poşman vedigere malê,Leylê navno dike û dixwaze,ku Mecnûn jê hez neke.Mecnûn ji malê derdikeve û dihere ber kaniya Sind-can,ku ew kaniya her gav keç diherin avê.

Li ber kaniyê Leylê û Mecnûn hev dibî nin.Mecnûn li wir pê dihese,ku Leylê ji wî hez dike.Roj li wan dibihire,berî eva rê Leylê tê bîra wê,ku mala bavê wê li hevya wê ye.Ew dixwaze here ji Mecnûn bê je,ku ewê zû bê cem wî.Mecnûn wê bernade û dibeje hinekî li cem wî bimîne.

Leylê morîya xewê dike guhê Mecnûn û berê xwe dide malê.Dibîne,ku mala bavê wê barkirîye û ketinin rîya zozana.Ew bi lez dide pê wan û dighêje koça mala bavê xwe.

Gelek wext diçe.Leylê dizane,ku Mecnûn li ber kaniye di xewde ma ye,lê kêsê

nabîne,ku here cem wî.Ew ji rêwiya di der-heqa Mecnûn pirs û pirsyanan dike,lê ke - sek nikare tiştikî jê re bêje.Carek refek teyr ji ber kanîya Sindcana difirin.Ley-lê ji wan dipirsi û pê dihise,ku Mecnûn hê di xewêde ye.Li ber kanîyê çivîkê helîna xwe di nav porê wî de çekirî ye û çûcûk derxistine.

Leylê xwe ji malê vedidize,berê xwe di de ser kanîya Sindcanê.Leylê morîya xewê ji guhê wî derdixîne.Mecnûn **nizane bê çi** hatîye serê wî.Gava çavêن xwe vedike ew ji leyîlê dipirse,ma mîvanê mala bavê vê çûnin an na.Wê gavê Leylê lê vedigerîne û dibê: "Mecnûnê rî kurisi,gîyha di nav rî yê bû ye rîsî,sala din vî çaxî mîvanê mala bavê min hatibû,tu îsal lê dipirsî..."

Li ber kanîyê ew hev hemêz dikan.Birê Leylê di wan derdikeve.Leylê pir ditirse û ji tirsa birê xwe dua dike,ku **Xwedê wan** bike steyr û ew bifirin ser ezmanan.Duayê Leylê qebûl dibe û Xwedê wan dike du steyra,ew difirin ser ezmana.Salê du caran,biharê û payizi ew rastî hev têن....

li paşî têksta dastana Xaris Bitlisî "Leyl û Mecnûn" û tercima wê bi rûsi M.B. Rûdenko şaxekî zargotina "Leyl û Mecnûn" di kitêba xwe da çap dike,ew şax ewê ji

zarê Qerexanê Şerefşan kurdê Çiristanê (Xurasan) li Aşxabadê nivîsi ye.

*Ne mumkûne eşq bit nihani,  
Henek hebitin, heye e'yanî,  
Şagirt di hucrê pê bi yek bar,  
Bi cumle ji hal bûne xeberdar.*

*Ev sêr nuha eşkera bû,  
Ci-ci gerîya û bela bû,  
Keybet qewî ji bo etbê,  
Agah kirin diya hebibê,  
Wê abdiya effîf û salîh,  
Wextê ku bihistine ev tirane  
Hal hal giri, rûy gil seri,  
Serdend birî û ser helkiri,  
Rabû bi xezb vehate Leylê,  
Ber kir bû qehr misalê Sêlê  
Rûnişt ber li lay qîzê,  
Gotê ku lewend bi temizi,  
Hala bi bihistiye ciwabek,  
Aşiq li te bûye şabek,  
Hikmet ne ewe, tu jê şa bî,  
Aşiq kir bû ya dil kuta bî.*

*Ey doxtera min, eva çi kare ?  
Ev kar ji bo te zêde a're,  
Ferze ji tera hub û perde,  
Royê te kesek bibîne derve,  
Bike te heyn hezar aşiq  
Aşiq bona te ne layq.*

*Te namûs û nisf li me bi ba kir,  
Loma ereba li me rewa kir  
Derzê te bibîne belki a're,  
Bikişîne di çavê li tare,  
Min bed biki dê biçi ji xanî,  
Bê nav benî di nêv zemanî,  
Êdî meşe mektebê tu caran,  
Çûna te niha qewî mubaran,*

(Ji Tarîxa Edebeyata

12 Kurdi.Prof.Q.Kurdo)

NAVÉ VAN HEYWANAN LI BINĒ WAN BINIVISIN



.....

.....



.....

.....



.....

.....

PEYVÊN PÊŞÎYAN

54 "Dinya bi dor e , geh li jêr e ,  
geh li jor e!"

55 "Fira mirîşkê heta ser sergoyê!"

56 "Serbirrin nayê kirîn!"

57 "Serê bêecel naçe gorre!"

58 "Heta mirinê çav li kirinê!"

59 "Gerîyaye, dirîyaye!"

60 "Lewra şikestîye ku xwar bicebire!"

61 "Kund û bazî birayê hev in!"


62 "Kew li ber kewê dixwîne!"

63 "Tevdan ji helîsê ra baş e!"

64 "Xeynê serşikestinê tev ji hevdigire!"

65 "Av dişe avayîyê!"

WAW HEJMARAN YEKO-YEKO BIGIHININ HEV



## D E R S I M

Dîyarê Dêrsimê çi dûman e,  
Dêrsim çîyayê ser destan e,  
Ji destê neyarêñ welatê min,  
Mêrxasê me dinav zinarandane,

Dêrsim nav û nîşana Kurdîstan  
Şer dike tum li hemberê neyaran.

Kî ji kurda re xwedî û xwedan e,  
Zarokêñ kurda dîkin emane,  
Ji destê neyarêñ welatê min,  
Bav çûne em sêvî manin.

Dêrsim nav û nîşana Kurdîstan,  
Şer dike tim li hemberê neyaran.






Seri rake mîze li deman e,  
Gelêñ dinê hemû li hewane,  
Ji destê neyarêñ welatê min,  
Em li erdê dibin pîyan dane,

Dêrsim nav û nîşana Kurdîstan  
Şer dike tim li hemberê neyaran.

Kurdîstan-1987

Şaxê Ciwan

NAVÊN WAN TIŞTANAN Lİ BINÊ WAN BINIVİSİN



P ^ E Z A N ^ I N

Pirs: 1

Tişkî min heye tiştanok,  
Dinya hemû têdaye.  
Ew çîye ?

Bersîv:.....

Pirs: 2

Kanîya qinê-qinê,  
Mîr û hakîm dest didinê.  
Ew çîye ?

Bersîv:.....

Pirs: 3

Divêm "were were" nayê,  
Divêm "Meyê,meyê" tê.  
Ew çîye ?

Bersîv:.....

DI NAV VAN NEH RESMAN DU HEB WEKHEVIN  
MA HUN DIKARIN WAN BIBININ ?



## QUNCİKA BAJAREN KURDISTANE


### BİNGOL (ÇAPAXÇUR) (1)

NAV : Navê wê ji 1922 an vir de Çapaxçûr e. Navê Bingolê yê kevnare Çewlik e. Di nav van 50 salên dawîn de, dewleta Tirkan heta jê tê hemû navêni bi kurdî, navekî bi tirkî lê dike. Weke tê zanîn mirov nikare navê zarokê xwe jî bi kurdî bide nivîsan-din... Armanca dewletê eve, ku ci tiştê bîh-na kurdî jê bê, winda bike û bide jibîrkirin. ji ber vê yekê; dijî van bûyera derketin û paraztina navêni kurdî perçak ji xe-bata wellatperwerî ye.



DİROK (TARİX) Ü BERHEMEN TARIXİ : Hêrêma Çapaxçur berî di bin destê Hûrrî ya, berîya mîladê 700 salî kete destê Med an. Berîya mîladê sala 600 da,kete bin destê Persan (Farisan).Piştî ku İskender li di-jî Farisan bi ser ket,herem ket destê emperatoriya Makedonya.Bi dû mirina İskender re,ev herem kete destê Ermenîyan.Piştî Ermenîyan,derdora Çapaxçurê ket destê emperatoriya Roma.Dem dema erebê misluman gîhiştin çapaxçûrê.Dîroka çapaxçûrê wekî hemû hêlên Kurdistanê di sala 1071 pê de hat guhertin.Ew tarîxa,ku tirk ketine Kurdistanê ye.Ji sala 1514 ande bi temamî ,





Rêyên makîna: —  
Rêya hesin : #####  
Qeza : ●  
Nahiye : ○

Çapaxçûr kete nav axa Osmanîyan.

CIH : Çapaxçûr li herêma firata jorîn dikeve.Li rojhilate wê Mûş,bakurê wê Erzerom û Erzîncan,li rojava Dêrsimê û Xarpêt(Elezîz) û li başûr Dîyarbekirê heye.


Çar qezeyên Çapaxçûrê û 323 gundêñ wê hene.Qezeyên Çapaxçûrê;Gênc,Karlıova,Kîxî û Solhan(Boxlan) in.

ÇIYA Ü ÇEM : Herêma Çapaxçûrê gelek bilînde.Bilindiya gelek çîyan ji 3000 m. zêdetir in.Deştêñ wê herêmê jî,ji bahrê 1000 m. bilindin.Çiyayê herî bilind bi navê Bîn gol di navbêra çemê Murad û avareş de dimîne.Li ser wan çîyan bê hejmar golên qesayê hene.Ji ber vî awayî tirkan navê çîyê kirîye "Bîngöl",navê bajêr jî,ji navê van çiyayan girtine û kirin "Bingöl".... Devera herî bilind 3250 mêtro ye.

Çiyayê Çötelê 2940 m,Çiyayê Şeytêñ 29-06 m,çiyayê Çavres 2793 m,çiyayê Şerefdi-nê 2544 metro bilindin.Di navbêra van çiyayan de deşta Çapaxçûrê heye.Di gelek cîhêñ deştê re çem derbas dibin.Ji ber vê yekê deştek avî ye.

Çemê herî girîng ava Mûradê ye.Ava peri û Goynukê jî tevî ava Muradê dibin.Ava Muradê li jora Kebanê bi ava reş re dibe yek û tevî Firatê dibin.(Dûmahîk heye)

Rêya rast bibin !



QUNCİKA MUZİK E  
NOTENİVİS CEMİLÀ CELİL

HER DAD 21.

Allegro

Her Dad, her Dad, her Da - do lo, Da . do - ka  
min Da . do. Da - do k'i - sik ni - qı - şa - (a)nd,  
Da - do - o, Da - do - ka min Da . do

Her Dad, her Dad, her Dado lo,  
Dadoka min Dado,  
Dado k'isik niqışand,  
Dado, Dadoka min Dado

Her Dad, her Dad, her Dado lo,  
Dadoka min Dado,  
Dado qızı melleye,  
P'aşıl t'ije xurmeye.

Her Dad, her Dad, her Dado lo,  
Dadoka min Dado,  
Ha li ber piştə, ha li teniştə,  
Hilk'ışand. Dadoka mi Dado

Her Dad, her Dad, her Dado lo,  
Dadoka min Dado,  
Dado qızı k'eqiše,  
P'aşıl t'ije k'ışmîşe

QUNC IKA XEZ IKA



ZO ZO'LAR BITTI.  
SIRA LO LO'LARDA

ZO ZO XELASBUN  
DOR HAT SER LO LO YAN

QUCIKA MATEMATİK E.

$$\begin{array}{r} 232 \\ + 7 \\ \hline \end{array}$$

$$\begin{array}{r} 263 \\ + 9 \\ \hline \end{array}$$

$$\begin{array}{r} 568 \\ + 5 \\ \hline \end{array}$$

$$\begin{array}{r} 128 \\ + 3 \\ \hline \end{array}$$

$$\begin{array}{r} 299 \\ + 8 \\ \hline \end{array}$$

$$\begin{array}{r} 198 \\ + 5 \\ \hline \end{array}$$

$$\begin{array}{r} 34 \\ + 48 \\ \hline \end{array}$$

$$\begin{array}{r} 57 \\ + 18 \\ \hline \end{array}$$

$$\begin{array}{r} 19 \\ + 62 \\ \hline \end{array}$$

$$\begin{array}{r} 45 \\ + 48 \\ \hline \end{array}$$

$$\begin{array}{r} 26 \\ + 39 \\ \hline \end{array}$$

$$\begin{array}{r} 49 \\ + 45 \\ \hline \end{array}$$

$$\begin{array}{r} 123 \\ + 241 \\ \hline \end{array}$$

$$\begin{array}{r} 143 \\ + 34 \\ \hline \end{array}$$

$$\begin{array}{r} 153 \\ + 28 \\ \hline \end{array}$$

$$\begin{array}{r} 456 \\ + 34 \\ \hline \end{array}$$

$$\begin{array}{r} 123 \\ + 47 \\ \hline \end{array}$$

$$\begin{array}{r} 283 \\ + 109 \\ \hline \end{array}$$

$$\begin{array}{r} 423 \\ + 168 \\ \hline \end{array}$$

$$\begin{array}{r} 222 \\ + 139 \\ \hline \end{array}$$

$$\begin{array}{r} 509 \\ + 142 \\ \hline \end{array}$$

$$\begin{array}{r} 683 \\ + 107 \\ \hline \end{array}$$

$$\begin{array}{r} 264 \\ + 27 \\ \hline \end{array}$$

$$\begin{array}{r} 503 \\ + 18 \\ \hline \end{array}$$

$$60 - 20 = \underline{\quad\quad\quad}$$

$$400 - 100 = \underline{\quad\quad\quad}$$

$$460 - 40 = \underline{\quad\quad\quad}$$

$$30 - 20 = \underline{\quad\quad\quad}$$

$$600 - 200 = \underline{\quad\quad\quad}$$

$$430 - 20 = \underline{\quad\quad\quad}$$

$$60 - 50 = \underline{\quad\quad\quad}$$

$$900 - 700 = \underline{\quad\quad\quad}$$

$$640 - 10 = \underline{\quad\quad\quad}$$

$$70 - 10 = \underline{\quad\quad\quad}$$

$$600 - 500 = \underline{\quad\quad\quad}$$

$$580 - 70 = \underline{\quad\quad\quad}$$

$$60 - 60 = \underline{\quad\quad\quad}$$

$$800 - 600 = \underline{\quad\quad\quad}$$

$$390 - 60 = \underline{\quad\quad\quad}$$

$$831 - 1 = \underline{\quad\quad\quad}$$

$$297 + 1 = \underline{\quad\quad\quad}$$

$$820 + 2 = \underline{\quad\quad\quad}$$

$$389 - 1 = \underline{\quad\quad\quad}$$

$$389 + 1 = \underline{\quad\quad\quad}$$

$$488 + 2 = \underline{\quad\quad\quad}$$

$$410 - 1 = \underline{\quad\quad\quad}$$

$$281 + 1 = \underline{\quad\quad\quad}$$

$$274 - 2 = \underline{\quad\quad\quad}$$

$$360 - 1 = \underline{\quad\quad\quad}$$

$$479 + 1 = \underline{\quad\quad\quad}$$




$$270 - 2 = \underline{\quad\quad\quad}$$

$$500 - 1 = \underline{\quad\quad\quad}$$

$$599 + 1 = \underline{\quad\quad\quad}$$

$$191 - 2 = \underline{\quad\quad\quad}$$

X A G E P I S



PÊZANÎN (34)

Pirs: 1

Him şil dike,  
Him dîwêr qul dike.  
Ew çîye ?

Bersîv:.. Dilop.....

Pirs: 2

Sivê çar linge,  
Nîvro du linge,  
Evarî sê linge.  
Ew çîye ?

Bersîv:.. Merî.....

Pirs: 3


Oda şustî-muştî,  
Cotê qazî têda rûniştî.  
Ew çîye ?

Bersîv:.. Çav.....

Pirs: 4

Du xuşkê cînar,  
Ji hevdu nakin bawer.  
Ew çîye ?  
Bersîv:.. Çav.....

X A Ç E P I R S




KEREKÎ ME HEBÛ Û KUNDURKÎ ME

KERÊ ME KUNDURÊ ME KOT KOT KOT,

ME JÎ ÇIROK Û MESELÊN XWE

YÊN VÊ HIJMARÊ JI WERÊ GOT

KULÍLK







YAN

# KURDISTAN

YAN NEMAN !

UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANE

ADRESS - NAVNİŞAN

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

PRIS : 10:- skr  
BIHA